

Faktora RHD û Antî D


Parastina nifin dû me

Dibe ku nuha ji we re hatibe gotin ku divê derzîya maddeyêke bi navê “Antî-D” li we bikeve û dibe ku hun dibêjin gelo ew çi ye û çima ji bo we pêwîst e.

Ev belavok bersîva her du pirsan dide û her weha îzeh dike ku çima ev derzîya hêsan dikane parastina giştî ya ji bo we pêwîst bide we – hem nuha hem jî di pêşedemê de.

Faktora RHD

Jinên ducan dikanin pircar komên xwîne yê ji pitikên xwe cûda hebin. Ev pircar birêkûpêk û normal e û bi gelemperî ne pirsgirêkek e. Lê belê bi qasî 1 ji 10 ducanîyan de ev komên xwîne bi awayekî bi taybetî girîng diguherin, û ew an hebûn an tunebûna malikên sor ên xwîne di hundirîne, berê jê re ‘Faktora Rhesus’ dihat gotin. Nuha bi hêsanî jê re Faktora RhD dibêjin.



Hek ev faktora RhD di malikên sor ên xwîna we de hebe, hun wek RhD-Pozîtîv tên naskirin. Hek tunebe, hun wek RhD-Negativ tên naskirin.



Faktora RhD dikane çawa bandûrê li we bike?

Carinan, çenek xwîn dikane ji dewra xwîna zarok a di hevalok de derbasî herikîna xwîna dê bibe.

Ev bi gelemperî hema berî zayinê dibe û pir normal e, di normalê de di $\frac{3}{4}$ ê hemû ducanîyan de diqewime. Lê belê ev tewre derbasbûna xwîna her weha dibe ku di piştî bûyereke taybetî wek jiberçûn an jiberxistinê (kurtaj) de jî biqewime .

Hek ev derbasbûna xwîna ji pitikeke RhD-Pozîtîv bo dayikeke RhD negatîv be, wê gavê sîstema muafbûnê ya dayikê wê xwîna pitik wek `biyanî` bibîne û wê antîbodîyan biafirîne ku hemû xwîna pitik a di dewra xwîna dayikê de wêran bike.

Sîstema muafbûnê ya dayikê di bîra xwe de hiltîne ku van antîbodîyan çawa çêbibe, û dike ku ew bikanibe wan di pêşdemê de hek pêwîst be zûtir û pirtir çêbibe.

Ev tenê di ducanîya dî wê de hek pitik dîsa RhD-Pozîtîv be û dîsa xwîna pitik ji hevalok derbas bibe dibe pirsgirêkek. Sîstema muafbûnê ya dayikê hefiza xwe bikar tîne ku dîsa wek berê heman antîbodîyan çêbibe. Ev dûre dikanin dîsa derbasî hevalokê bibin û dest pê bikin ku xwîna pitik a di dewra xwîna pitik a berî zayinê de wêran bikin.

Pitikên ku ev pirsgirêk hene jê re tê gotin ku Nexweşîya Hemolîtîk a Nûbûyîyan an bi kurtî HDN heye.

Ji Antî-D parastin sitandin

Doktor, hemşîre û ebe ji vê pirsgirêkê pir haydar in û dikanin derzîyeke Antî-D li dayikê bixin û pêşî lê bigirin (Ji kerema xwe agahîya berhemê ya di pakêta de bixwînin)

Antî-D berî ku dayik bikanibe antîbodîyên xwe çêbibe hemû xwîna ji zarok ketiye nav dewra xwîna dayikê wêran dike.

Ev tê wateya ku dayik antîbodî tune ku di ducanîyên pêşerojê de bibe sedema HDN.

Ji ber vê yekê derzîyeke hêsan a Antî-D hem dayikê hem jî pitika wê di ducanîya pêşerojê de diparêze.



Hek hun şik dikin bipirsin

Ebe, doktor an hemşîreya we wê bi kêfxweşî bêtir agahî li ser Faktora RhD û ku ji bo we tê çî wateyê ji we re bibêje.

Hek pirsên we hebin, an hek li ser derzîyê şikên we hebin, bêtirs bipirsin.

Navê ebeya we:

.....

Navnîşana Têkilîyê:

.....

.....

.....

.....

Hejmara Telefonê:

.....

Xizmeteke agahîyê ji bo nexweşan ji:



BPL unîteke Sazîya Xwînê ya Neteweyî (NBA) ye
NBA sazîyeke taybetî di nav NHS (Xizmeta Tendurustî ya Neteweyî) de ye.

Bio Products Laboratory, Dagger Lane, Elstree
Hertfordshire. WD6 3BX UK
Telefon: 020 8258 2200
www.bpl.co.uk